Erê Efrîna min



Ebdilmecît Şêxo

Cobarên xemgîniyên te, di bin lehiyên nalînên dayika te de,
di newalên dilên me de
sêlroyekê bi firmêskên zarên tazî,
bahozên bin lingên dayikên pakrewanên bajarê min
helbestên serxweş dirêstin.

Cobarên xemgîniyên te, di rêyên çelexwarî de,
bi qaserî stêrkên ezmana Zîna min
pêrgî darên sindiyanê, zeviyên zeytonan tên.

B hev re bi zimanê "Çiyayê Kurmênc"
li ber pêlên çema "Arasê" ya ku rojekê ji rojan
qehremanên Kurdistanê li pişta xwe mîna fireşteyên,
dilên cangoriyan sîwar kiribûn,
û
li ser destên şaxên bênbuharî de rawestandin.

Cobarên xemgîniyên te di ber tîrêjên çavên jineke Kurd re diherikin,
rûyên xwe bi sê rengan di eniya "Çiyayê Lêlon" de çandin
û
çend rûpel ji dîroka kela Horî ji balêndên dilên cegerşikestiyan re

xwendin .
Cobarên xemgîniyên te, di nîva şevê de li deştên bêhngenimî,
bêhnhenarî,
bêhnmêwên tirî
rastî govendên kotirên bask birîn hatin.

Cobarên xemgîniyên te bi dilopên jinebiyên welatê min re,
bi serbilindî ji xwe re mêvanxaneyekê di devê hîvê de ava kir .
Cobarên xemgîniyên min, xwe bi hilmên mindalên "HELEBCE"
li ber bendergeha çavên bêzar şuştin .
Cobarên xemgîniyên te, seqamên li ser piştên nûgihayên me,
berfên li ser sînga destanên welatê min herifandin
û
rodankên nûh ji xwe re bi dîdema stêrkan ava kirin .
Cobarên xemgîniyên te, Siruda "Ey Reqîb" ji xwe re kirin pîrozgeh,
rengên xwe bi ava kaniya "Basutê", bi kenîna "Ednanê Cindo",
bi limêjên wî li ser miriyên bajarê xwe dişuştin
û
di ezmanê keçên Efrînê de fireşteyên dilên xemgîn tîmar dikirin.
Cobarên xemgîniyên te,
îro hîştin ku keskesor bi rondikên xwe awênan ji dîlbera min re ava
bike.
Cobarên xemgîniyên te, bila îro di 10 nîsanê de hestên xwebi şabûna
Loriya ya rizgarkirî
bi rondikên bê guneh xwe aşle bike
û
bila çûkên çavên te,
cîrokên dê û bavê di şevên zivistanê de,
ji gulistanan re bixwînin.
Cobarên xemgîniyên te, bila di nav pîsîrên dayikan de bikenîn
û
Giriyên sirûşta deştên genimî, hêrên henaran, hêlanên pîrozî çê kin.
Cobarên xemgîniyên te, dê rojekê li ber bayên lingên dapîra min
û
di nav lêvên gira "Endarê" de
HÛR, HÛR BIBIN.
Erê EFRÎNA min
Erêê ê ...